

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

Hejmar: 6


Sal: 1

Adar 1993

Biha: 10.000 TL

Îda Remezanê û Cejna Newrûzê pîroz bin!





Xwedî

(Sahibi)

MAHMUT YARLUG

Berpirsiyarê Giştî

(Genel Yayın Yönetmeni)

SABAH KARA

Berpirsiyarê Nivîsaran

(Sorumlu Yazuşleri Müdürü)

SÜLEYMAN ÇEVİK

Mudîrê Abonetî û Belavkirinê

(Abone ve Dağıtım Müdürü)

MÜŞTEHİR KARAKAYA

Mudîrê Tîprêzî û Arşivê

(Dizgi ve Arşiv Müdürü)

ALİ KARADENİZ

Muşawîrê Nivîsaran

(Yayın Danışmanı)

MUSTAFA GOYANI

nûbihar kovareke mehanî ye ku bi weşandina karpêkên çanda Kurdî bi mana tevayî dilebîke. Raman û rayên xwedyên karpêkan, lîzûmen ne raman û rayên *nûbihar* in. Nivîsarên ku bi înzeya Berpirsiyarê Giştî weya bi navê *nûbihar* tîn weşandin raman û raya *nûbihar* nişan didin. *nûbihar* di serrastkirina karpêkên şandî de azad e.

Bedela abonetiya salinî:

Li hundîr: 120.000 TL

Li derve: 50 DM

Jimareyên hesabê:

Li hundîr: Postgiro (Posta Çekî): Süleyman Çevik, 658265

Li derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

Navnişan (Adres):

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3

Fatih - İstanbul

Tel: 533 75 88

Tîprêzî (Dizgi):

nûbihar

Berg (Kapak):

Dönüş

Çapxane (Matbaa):

Mutlu Ofset

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

DESTPÊK

- Îda Remezanê û Cejna Newrûzê pîroz bin!.....3

nûbihar

SERNIVÎSAR

- Nameyên bêcewab / 9.....4

SABAH KARA

AYETNAME

- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd5

AZAD ZELAL

LÊPÎRSÎNA "PÎRSGÎRÊKA KURDAN"

- Pîrsgirêka Kurdan9

RAIF Ê BÊÇARE

- Nivîskar **İSMETULLAH ZAHİROĞLU**.....10

- Devxweşî û zikxezebî û boça rep.....15

MEHMÛD ÇELİKTEPE

- Xelasiya Kurdan bi İslamê ye19

MUHEMMED GÜNER

NIVÎSAR

- Munafiq û Yahûdî6

EBDİLLAH BEYHAN

- Yekîtiya mislimanan, tîrsa neyara ye!.....7

EBDİLLAH REMEZAN WANİ

- Hz. Omer dibêje.....12

HEQPEREST

- Bedîuzeman Seîd ê Norsî.....21

SÜLEYMAN ÇEVİK

HELBEST

- Ciwanan re.....10

MAFXWAZ EVİNDAR

- Nameyên bêcewab / 5.....14

SABAH KARA

- Berxwedan.....17

HESENİ

- Têkeve rîya rast dilo18

YÛNIS EMRE / HOZAN OFLAZ

- Bixwaze çavê mi giryan dike Dost.....18

UMMÎ SİNAN / HOZAN OFLAZ

- Xwendin.....20

EBDİLLAH REMEZAN WANİ

- Ax derdê azadiyê21

GULTEN YAŞA

ZAROKNAME

- Çiroka Ristî.....24

M. AZAD - SABAH KARA

ZAZAKÎ

- Leşkero şêr, brao delal30

M. KEMALİDİN BEŞİRAN

- Zazakî watenî.....30

BÊKES SERKANİ

NAMEYÊN WE

- Behram Etmanî / 5 • Ebdilhelîm Yılmaz / 8 • Ehmed

- Dogan / 11 • Muhemmed Azadîxwaz / 13 • Kamuran

- Uygar / 15 • Sumeyye Amed / 16 • Osman Şanlı / 30

- FERHENGOK**.....31

- RÊZEPİRS**.....32

ELİ KEÇELİ



ÎDA REMEZANÊ Û CEJNA NEWRÛZÊ PÎROZ BIN!

Em îsal mehekê de du îdan pevre dijîn û pîroz dikin. Na; na! Sê îdan pevre: Newrûz û Îda Remezane û pîrozkirina van du îdan di kovareke navxweşik de, di kovareke xwerû kurdîziman û mizgînvana bihara çand û huner û edebiyata kurdî de... Biharek nû û Nûbihar! Newrûz, yanê nûroj; Îda Remezana bimbarek; û Nûbihar, yanê bihara nû! Ev sê îd, li hemû xwendevanên me û hemû mislimanan pîroz bin.

Em ê ewil Newrûzê û hatina biharê di 21'ê Martê de bijîn û pîroz bikin û dûre, di 24'ê Martê de jî bi gehîştina Îda Remezana bimbarek, wê dilê me şa bike.


Herkes zane ku Îda Remezane çi ye. Lê ma gelo Newrûz çi ye?

Newrûz, zimanê farsî de bi maneya "roja nû" ye ku kurdiya vê bêjeyê "Nûroj" e û di heqîqetê de gereke em kurdan, em jê re bibêjin "Nûroj" ku roja ewil a teqwîma me û hemû ariyan e. Lewra teqwîma me kurdan û ariyên din di 21'ê Martê de dest pê dike; 20'ê Martê de Adara kurdî û Îsfenda farsî temam dibe û 21'ê Martê de Nîsana kurdî û Ferwerdîna farsî dest pê dike.

Newrûz di nav arinjadan da him bi sebeba sersalbûnê û him jî bi maneya destpêka biharê û bi şiklê "Îda Biharê" pîroz dibû ku piştî mislimanbûnê jî ev cejin dewam kir û hetta yên ne arî, weke ereb û tirkan jî dest bi pîrozkirina ve cejnê kirin.

Ereb di erebî de jî vê cejnê re dibêjin "Nayrûz" û hê jî, xusûsen li Iraq, Sûrî û

nûbihar



Misrê pîroz dikin.

Di nav tirkan de navê vê cejnê mîna farsan, "Newrûz" e ku ew jî bi teqlîda ariyan dest bi pîrozkirina vê cejnê kirine.

Weke ku hun dizanin, vê henganê jî her sal di bajarê Manîsa de Newrûz pîroz dibe û şêrîniya Mesîr (:Mesîr Macunu) pêşkeşî xelqê dibe.

Zemanê Osmanî de Newrûz pîr bi debdebe pîroz dibû. Şair helbestên ku li ser Newrûzê dinvisandin teqdimî padîşahan û serokan dikirin û jî wan hediyeyan digirtin. Navê wan helbestan "Newrûziye" û navê hediyeyan jî "Newrûziye Pîşkesî" (:

Pêşkêşa Newrûzî) bû ku heman hemû şairên Osmanî jî van Newrûziyeyan nivîsandine.

Dawî, van rojan rejîma Kemalîst jî dixwaze li vê cejnê xwedî derkeve, da ku nava wê vala bike û îznê nede ku kurd jî bona gehîştin bi mafên xwe yên însanî û îslamî, jî vê pîroziyê îstîfade bikin. Lê ev xebata wan wê li hîçê derkeve û wê nikaribin zilm û qedexekariya xwe bidin jibîrkirin.

Em ê jî vê roja pîr bi bereket îstîfade bikin û zilma zaliman li ruwê wan bixin.

Em ê her bihar weke gulan, di Newrûzê de bi bayê canbexş î biharê jî xewa dirêja zivistanê hişyar bibin û jî zilma Fir'ewnî û Qarûnî re bibêjin "na"!

Berî her tiştî Îda Remezana we û Cejna Newrûza we pîroz be!

Rojiya Remezane xweş, Îda Remezane xweş, hatina biharê xweş, Cejna Newrûzê xweş û xwendina Nûbiharê xweş!

Tim di xweşiyê de bin!

NAMEYÊN BÊCEWAB / 9

21 Adar 1991

Gehîşt cardin Newrûz
 Himkufê hevin cardin
 şev û rojê min
 Ji derna çav dimiçînê bihar
 aşîkar neaşîkar
 Ma wê bipengivin birînê zivistanê
 di dilê şerhe şerhe de

Gehîşt cardin Newrûz
 Roj himkufê hevin cardin
 Û biharê mizgîn dike
 bi dewsa kulîlkan
 xwîna ku diherike ser axa sar
 Bi dewsa agirên Newrûzê
 agirê tîfinga pêdikevin
 Meydan tijî dûxan dibîn
 Kulîlk spî lixwe dikin
 bi dewsa hemû rengan

Gehîşt cardin Newrûz
 Çi xwîneke bêmîhayet
 ku her bihar
 Mîna ku ji ewran biherike
 baran baran
 Rengê xwe ji laleyên boran
 dicivîne û dide hev

Gehîşt cardin Newrûz
 Dest pê kir maceraya himkufê mazî
 Lê êdî bavê min ne sax e û loma
 Ez digrîm bi dewsa wî
 nûha bi figan
 Yanê himkufê hevin
 şev û roj
 Yanê himkufê hevin
 bav û zarokan

Sabah Kara

ÇEND AYETIN JI QUR'AN A MECÎD

Weke ku xwendevanên me zanin, em di ber hejmara xwe de çend ayetan ji Qur'an a Mecîd diweşînin. Heta nûba me Sûreta Fatîhe û 125 ayetan ji Sûreta Beqere weşandin. Em ê înselaha di hejmarê xwe yê hatî de jî vê xizmetê bidomînin. Di vê hejmara me de ayetên 126 îla 150 ên Sûreta Beqere li jêr hatine:

AZAD ZELAL

SÛRETA BEQERE

Bi navê Xweda yê mihriban û dilovan.

126- Îbrahîm gotibû: "Ya Rebbî, vî bajarî bike cihê emn û emniyetê û bi xelqê wî yê ku bi Xweda û roja axîretê îman anîne, ji semereyan rizq bide." (Xweda) got: "Û yê ku bibe kafir, Ez ê bikim ku hinek jê îstîfade bike û paşecar Ez ê wî

têxim ezaba agir de, ku ew çî serencameke bed e!"

127- Û Îbrahîm û Îsmâil stûnê Xanî (:Kabe) bi jor de birin (û gotin:) "Ya Rebbî, ji me qebûl bike, ku Tu dibhîsî û dizanî."

128- "Ya Rebbî, me herduyan ji Xwe re bike fermanber (:mislîman) û zarû û zêçên me bike umeteke fermanber (:mislîman) ji Xwe re. Wezîfe û îbadetê me bi me hîn bide û tewba me qebûl bike, ku Tu tewbeqebûlvan û mihriban î."

*Bi sayeta Nûbihar,
ko Xwedê hezke em ê Kurdî hînbin û
hê jî bi pêş de herin*

Brayên ezîz û muhterem!

Berî her tiştî silava Xwedê li we dikim û ev cebha we ya pîroz jî pîroz dikim. Ji Xwedayê xwe yê dilovîn û dilovan jî arîkarî û înayet rîca dikim. Da ku ev xîzmeta hanê umreke dirêj û serfirazî pêre be.

Ez li vê derê evê îtiraf dikim ku, aliyê zimanê zikmakî û nivîsandinê de ez pîrr celeb im. Sedema vê jî aşîkar e. Bi sayeta *Nûbihar*, ko Xwedê hezke em ê Kurdî hînbin û hê jî bi pêş de herin.

Ev name, jîndariya min de, bi Kurdî nivîsandina min a ewil e. Loma xelet û çewtî tê de gelek in.

Ji ber van sedeman, li ser "Pirsgirêka Kurdan" de gotarekî Tirkî min nivîsand û ji we re birê kir.

Behram Etmanî

Munafiq û Yahûdî

Rojek ji rojan, carek ji caran, rehmet li bavê hazir û guhdaran, yê me û we jî. Yahûdî-
yek û munafiqek ji bo tiştêkê pevçûn dikirin. Ye yahûdî ji yê munafiq re dibêje:

—“Ez û te em nikarin xwe li hev bînin. Were em biçine nik Pêxember, bila ew mabeyna min û te de hukm bike.”

—“Na, em biçine rex Keab kurê Eşref.”

—“Te çi got, te çi got? Yekî weke Muhemmed adil qey nav me de heye? Tu çawa behsa Keab kurê Eşref dikî?”

Yê munafiq hindikî mijûl dibe û mulaheze dike, dûvre qebûl dike û diçine rex Pêxemberê me û gotinê xwe jê re dibêjin.

Pêxemberê me (selat û selama Xwedê li ser be) hukm dike mabeyna wan de. Yê yahûdî qebûl dike, lê yê munafiq qebûl nake û xwe davêje lingê yê yahûdî:

—“Îllahim tê bê em ê biçine rex Omer, bila ew hukm bike.”

—“Çawa dibe ku hukmê ku Pêxember daye, Omer bikare vergerîne?”

—“Çawa be bila bibe; rabe ser xwe, em herin.”

Radîbin têne rex Hz. Omer (r.) û yahûdî jê re dibêje:

—“Ey Omer! Ji bo me vê bûyerê safî bike. Em çûne rex Pêxemberê we, ji min re got ‘tu xwedî heq î’; lêbelê ev zalimê hanê vê qebûl nake û bi wî hukmî razî nabe... Em hatine rex te ku tu qatî qerarekî bidî. Vî ji min re got ‘îllahim tê bê em ê biçin’, lewra ez hatim.”

Hz. Omer berê xwe da yê munafiq û jê pirsî:

—“Tu çi dibêjî? Ma ev tiştên ku ev yahûdî dibêje hemû rast in?”

Munafiq cihê xwe de hiltavije:

—“Belê, hemû rast in, ey Omer!”

Çawa vê xeberdanê dibihîse, Hz. Omer (r.) destê xwe davêje şurê xwe û dibêje:

—“Yê ku bi hukmê Resûlê Xwedê razî nebe, ez awha heqê wî didimê!”

Ebdillah Beyhan

129- “Ya Rebbî, ji nav wan ji wan re peyamberî bişîne, da ku ayatê Te ji wan re bixwîne, kitêb û hîkmetê bi wan hîn bidê û wan pak û pakîze bike. Tu pîrozmend û hekîm î.”

130- Kî berê xwe ji mîlet û dîne Îbrahîm diguhere, ji bil yê ku bûye sefîh û ji rê derketiye? Me wî (:Îbrahîm) dinyayê de hilbijartiye û ew axîretê de jî ji salîha ye.

131- Wextê ku Rebbê wî jê re got: “Teslîm bibe.” Got: “Ez teslîmî Rebbê Aleman bûme.”

132- Îbrahîm vê yekê bi zarokên xwe wesiyet kir. Yaqûb jî (got): “Zarwê min, Xweda ji we re vî dîni hilbijartiye; nebe ku hun ne misliman bimrin (:gereke hun misliman bin û mislimanane bimrin.)”

133- Ma gelo wextê ku Yaqûb dikir bimre hun li wir hazir bûn? Wî ji zarokên

xwe re got: “Ma hun ê piştî min ji kî re îbadetê bikin?” Gotin: “Ji Xweda yê te û Xweda yê bavê te Îbrahîm û Îsmâil û Îshaq re, ji wî Xweda yê yek û yekane re em îbadetê dikin û em teslîmî Wî bûne.”

134- Ewan umetin bûn ku buhurt in. Tiştê ku wan qezenc kir, ji wan re ye; û tiştê ku we qezenc kiriye, ji we re ye. Ji tiştê ku ewan kirine, hun ne mesûl in.

135- Gotin: “Bibine Cihû yan File, da ku hun bighêjine hîdayetê.” Bibêje: “Na, em ji dîne henîfê Îbrahîm in û ew ne ji muşrikan bû.”

136- Bibêjin: “Me bi Xweda û bi (ayet) ên ku ji me re nazil bûne û yên ku ji Îbrahîm û Îsmâil û Îshaq û Yaqûb û neviyên wan re nazil bûne û bi yên ku ji Mûsa û Îsa re hatine û yên ku ji Rebbê wan ji peyamberan re nazil bûne, îman

Yekîtiya mislimanan tirsî neyara ye!

Îro ser ruyê cîhanê milyarekê zêdetir misliman hene. Lêbelê ew qeweta pîrr mezin bûye çend dewlet û her yek ji wan bi navekê tete naskirin.

Çawa ku tova nîfçê ji salên berê heta îro avêtine nav mislimanan û ew kirine dijminên hew. Yek misliman ji yê din hez nake. Xelqê Misrê hez xelqê Suriye, xelqê Urdunê hez xelqê Kuweytê, xelqê Erebistanê hez xelqê Yemenê, xelqê Iraqê hez xelqê Kurdistanê nake.

Ew tova gelacê ku bi destên neyaran bi zanîn hatiye awêtin, nav mislimanan de pîrr cih girt.

Gelo ev tova nîfaqê bi destê kê hate çandin û çima?

Ew mirovên ku ji qeweta me mislimanan ditirsin û bêkêf dibin, wan ev tova çandin. Ger hun bêjin wana kîne? Bersiva wê ewe ku ew Emerika û Îngilîz û Fransa û dewletên dinê yên file ne.

Ma qey Îngilîstan nîne ku nivê dinyayê bi kedxwarîyê belengaz kir?

Disa ew tova nîfaqa ku Fransa avête naw Cezair û Tûnisê, hê niha jî paqij nebûye.

Gelo bi sed hezaran çermisorên Emerika kude çûn?

Ma Emerika ne ewe ku îro jî zenciyên xwe re muamela nexweşî û bê însafî û ne însanî dike?...

Ma Îngilîstan nîne ku însanên xeynî xwe xulam (xîzmetkar) hesab dikin û qîmeta seyên xwe jî nadne wan?

Xelqê Îngilîstanê wiha dibêjin:

“Heqê jiyane ser ruyê dinyayê yê me ye. Paşî yê seyê me ye. Paşî yê însanên dinyayê ye.”

Ji bona menfaeta xwe zilmê li herkesî dikin û naxwazin ku yên dinê heqên xwe bixwazin.

Ew qewetên fileyê yekbûyî naxwazin misliman bibine qewetek û yek bin.

Îro ji me re bese, halê Filistin û Bosnayê îbret e.

Êdî wextê yekbûna mislimanan hatiye û derbas jî bûye. Ez vê ayeta Xudayê mezin bira we tînim û kilama xwe xilas dikim:

“Hun gel, ji kapa (bena) Xwedê bigrên û hew neqetên.”

Ebdillah Remezan Wanî

aniye. Em di nav peyamberan de ti ferqîtiyê nakin û em teslîmî Xweda bûne.”

137- Heger ewan jî bi tiştên ku we îman aniye îman bînin, wê bighin hîdayetê. Lêbelê heger ji vê rû bizîvirînin, wê di tenaqûz û îxtîlafê de bin. Xweda besî we ye û Ew, bihîstvan e û zana ye.

138- Ev rengê Xweda ye. Ma rengê çi kesî ji rengê Xweda çêtir e? Em ji Wî re îbadetê dikin.

139- Bibêje: “Ma hun di heqê Xweda de bi me re munaqesê dikin? Ew him Rebbê me û him Rebbê we ye. Emelên me, yên me; û emelên we yên we ne. Û

em bi pakdilî tabîê Wî ne.”

140- Aya hun dibêjin “Îbrahîm û Îsmâîl û Îshaq û Yaqûb û neviyên wan, Cihû yan File bûn”? Bibêje: “Ma hun çêtir dizanin, an Xweda? Kî ji yê ku li cem wî şahîdiyê ji canibê Xweda heye, lê wê (şahîdiyê) diveşêre, zalimtir e? Xweda ji tiştê ku hun dikin, ne xafil e.”

141- Ew umetek bûn; hat in û buhurt in. Tiştê ku wan qezenc kirin, yên wan, û tiştê ku hun qezenc dikin, yên we ne. Ji tiştê ku wan kirine, hun ne mesûl in.

142- Ji xelqê, yên ku kêma aqil in wê bibêjin: “Çi tişt wan (mislimanan) ji qib-

leta ku berê xwe didanê vegerand?" Bibêje: "Rohilat û roava, yên Xweda ne. Ew kî bixwaze, dighîne ser riya rast î rast."

143- Me we wisa kire umetek ji hemû umetan çêtir, da ku hun li ser mirovan bibine şahid û Resûl jî li ser we bibe şahid. Û Me wê qibleta ku te berê xwe didayê nebediland, ji bil vê yekê ku Em bizanin wê kî bibe tabîê Resûl û wê kî li wî muxalefetê bike. Rastî, ev kar, ji bil yên ku Xweda wan gihandiye hîdayetê, (bareke) pirr giran e. Xweda ti carî îmana we wînda nake. Muheqeq ku Xweda ji mirovan re mihriban û dilovan e.

144- Em dibînin ku tu çavê xwe li azman digerînî. Em ê berê te bidin bi alî qibleta ku dilê te dixwaze. Berê xwe bide bi alî Mescida Haram. Hun li kûderê bin, berê xwe bidin wî alî. Ehlîkitêb dizanin ku ev (guhertina qibletê ji alî Mescida Aqsa, bi alî Mescida Haram), heqqek ji canibê Rebbê wa ye. Û Xweda ji tiştê ku hun dikin, ne xafil e.

145- Bi ehlîkitêb tu çî delîlî bidî, cardin jî ew berê xwe nadine qibleta te û tu jî berê xwe nadî qibleta wan. Ew jî berê xwe nadine qibleta hevûdu. Heger tu piş-

tî vê ilma ku ji te re hatiye, tu bibî tabîê hewa û hewesên wan, wî wextî tu ê bibî ji zaliman.

146- Yên ku me kitêb daye wan (:ehlîkitêb) weke ku zarokên xwe nasdikin, wî (:Peyamber) jî nasdikin. Lêbelê grûbek ji wan, digel vê qasê ku heqîqetê dizanin, wê diveşêrin.

147- Heq ji canibê Rebbê te ye. Naxwe teredudê meke.

148- Herkes berê xwe dide aliyekî. Naxwe di qencî û xêrê de bi hev re mûsabeqê bikin. Hun li kûderê bin, wê Xweda we bîne cem hev. Muheqeq ku Xweda li her tiştî qadir e.

149- Tu ji kûderê derkevî, berê xwe bide Mescida Haram. Heq ew e ku Rebbê te dibêje. Û Xweda ji tiştê ku hun dikin, ne xafil e.

150- Tu ji kûderê derkevî, berê xwe bide Mescida Haram. Hun (jî) li kûderê bin, berê xwe bidinê; da ku ji bil stemkaran ti kes nikaribe bi we re munaqese bike û delîlan bide pêş. Ji wan metirsîn, ji Min bitirsîn, da ku Ez nîmeta xwe ya li ser we tekîl û tamam bikim. Dibê ku hun bighine hîdayetê.

Nûbihar ji derdê me re bû derman

Bismihî subhanehû

Esselamû aleykum...

Gelî xebatkarê muhterem ên kovara *Nûbihar*.

Berî her tiştî ez pirr spas dikim ji bo kovara *Nûbihar*. *Nûbihar* ji derdê me re bû derman. *Nûbihar* li ser agirê dilê me bû wek ava cemidî, li gor min.

Lêbelê ko hinek tiştine din jî tê de hebin we kovara me çêtir û xweştir be.

Ew tiştana jî ev in:

1. Di her hejmarê de, jiyannamek hebe we baş çêbe. (Şêx Seîd, Ehmed ê Xanî, Ehmed ê Cizîrî û hwd.)

2. Di her hejmarê de divê dîroka (:tarîxa) Kurdî hebe.

3. Helbestên we xweş in; lêbelê pirr in.

4. Di sehîfa duyem de li bin karîkaturê ko hun nivîseke manedar binivîsin wê xweştir be.

Xwedê qawetê bi destê we de.

Ebdilhelîm Yilmazer

LÊPIRSÎNA "PIRSGIRÊKA KURDAN"

PIRSIYARÊN LÊPIRSÎNA ME:

- 1- Ray û ramana te di heqê "Pirsgirêka Kurdan" de çi ye?
- 2- Ji bona hel û fesilkirina vê pirsgirêkê pêşniyarên te çi ne?

PIRSGIRÊKA KURDAN

RAÎF Ê BÊÇARE

Bersiva Yekemîn: Ray û ramana min di heqê pirsgirêka Kurdan de ev e: Îro di gerdunê de, gelek netewê zordest keda netewê din xwarine û wan xizan hiştine. Him xizan, him nezan, him belengaz... Ji van netevan yek jî netewê Kurd e. Çawa rewşenbîrê Kurdan Mele Seîd ê Kurdî jî dibêje, sê cewherê Kurda henin. Çav nebar û xêr nexwazên Kurdan, bo ku Kurda bixin bin destên xwe, wan ji wan cewherê wan dûrdikin. Ev cewherana: Îslamiyet, însaniyet û millîyet e (musbet). Lazime wekî netewên din (Ingilîz, Elman, Erebb, Faris, Tîrk, Frensî...) hebûna netewê Kurd û hebûna zimanê wî, hebûna çand û huner û edebiyata wî, mafên wî, bê ecibandin û qebûlkin. Lewra cihêbûna reng û zmanê netevan ji Xweda ye. Kî qebûl neke, gawir e. Lewra ko hebûna yekî neyê qebûlkinin, mafên wî nayên dayîn.

Bersiva duyemîn: Ji bo hel û fesilkirina vê pirsgirêkê pêşniyarê min evin: Zarokê ko neg-

rî tu kes xwarin nadiyê. Ji bo vê lazime pêşî mirovên Kurd mafên xwe bixwazin. Ji bona vê xwestinê jî, lazime ku Kurd li ser nuqtekî bibin yek. Kî dikare mafên wan bide? Gerek ewî pîr rind nas bike. Lewra hezar dijmin ji Kurdan re dibêjin em ê mafan bidin we. Hetta ku bi-xapînin, wan ji xwe re bikin kole. Îro gelek zalim, xwînaxar, li ser Kurdan listikan dileyizin. Ji Kurdan re xefik û defika çêdikin. Ko Kurd çavê xwe veneke, ewê bikeve qeyd û dafikên wan. Kesê ku doza mafên Kurda bike, gereke bizanibe ku bi eraq vexwarinê, bi qumarê, ji netewekî misliman re xebat nayê kirin. Xîret û hamiyeta ji bo netew lazim e.

Gotina min a paşî eve: Ko mirov kete xerqê, kindira rîsî nikare mirov derxe. Kindireke zexm dixwaze. Ew kindir jî, tefsîra Qûr'an a Hekîm, Rîsaleyên Nûr e. Ko em xwe pê bigrin û bawer bikin em ê ji xerqê derkevin. Lewra seydayê Seîd ê Kurdî ji me ye. Reçetên wî ji me re derman in. Bila xapxapok me nexapînin. Hişyar bin!...

Hêvîya Rebbê âlemê de bimînin.

Nivîskar

ÎSMETULLAH ZAHİROGLU:

"DI ŞEVEKÊ DE BI MA'RÎFETÊN
HOKUS-POKUS HEVÇEND MILETAN
TINE QEBÛL KIRIN Û BI TEORIYÊN
XWE YÊ MEŞHÛR, ÎDIA KIRIN KU
HERKES BI XWÎNA ESÎL (!) BÛYE
TIRK. AXIR DEST BI ÎNKARA
TEMAMA XELQAN KIRIN"

Pirsgirêka Kurdistan, ji dewletên ku li vê herêmê mewcûd in û ji mekanîzma siyasîya navnetewî ne mumkine bête cûda kirin; an jî ev pirsgirêk, ji dormandora xwe nayê razberkirin.

Hetta wisa xwiyaye ku, bê xapînoka "Sazumana Dinya ya Nû" ev mijar ne mumkin e ku bête berdestkirin. Heger ji vê cîhetê em li pirsgirêkê mêzekin, mumkine ku em van tiştan bibêjin:

Sazumana Dinya ya Nû, em dikarin bibêjin ku ji gelên mazlûmê dinyayê re hêjarî û zordestiyek behtir û jiyaneke tije xwîn, tije hêstir û tije jan e.

Ihtîmalek pirr xurt e ku, gelê Kurd ji vê nenêrinê bi awakî pirr giran para xwe bigre. Vê têgiha (fikra) emperyalîst û sitemkara ku bi navê Sazumana Dinya ya Nû tête nas-kirin, dibe ku bi awakî Kurdistan anîbe rojevê. Lêbelê ev rojev, weke ji bil galgalê wêdetir neçuye, tengasîkêşa civakî, di mercên herî giran de jî li wan bar kiriye.

Sazumana Dinya ya Nû, ku ABD serîkêştîya wê dike, bi awayekî temamî ne dilxwazê helkirina pirsgirêka Kurda ye. Li Kurdistanê bûyerên dijwar û lêkerên helişandî û şewitandinê, ku TC li navçeyên gelê Kurd dike, em dikarin bibêjin ku ji bo vê yekê delîlên

Ciwanan re

Hey ciwanên çeleng û rind
Bi dengêkî awaz-bilind
Bixwînin Qur'an a Xwedê
Wek mînayê teyrê quling

Hey ciwanên bala-berzan
Dibistan kin deşt û zozan
Ji bo nivîs û honandin
Qedexekin xew û razan

Dengedarim li ciwanan
Dest bidin hev bibin bran
Wek bruskên ewrên tarî
Biteqin li ser neyaran

Wan şehîda wan nemiran
Tekoşin dan meh û salan
Bo dîn û namûs û welat
Wek buraqan serê xwe dan

Mafxwaz Evîndar

Zimanê Nûbihar gelik xweş e, şêrîn e weke hingivîn e

Bi navê Yezdan ê dilovan û mihriban.

Selamên Xweda yê mezin ser we dost û hevalên delal bin. Bereket û arîkariya Yezdan ê mezin bi were bê heta serketin û serfiraziyê.

Ez nizanîm bi çi kelîmê we pîroz bikim, ji bo vê xelata hêja û giranbiha, ji bo vê bihara ku we diyarî Kurdê hejar kiriye. Xweda kulîlkên vê bihara salewext geştir bikê. Tirêjên vê rojê, tarîtiya tîra ser her çarhêlê Kurdistanê biqetîne, bêqudûsiya hazar salan, ji hemû derûwarê welatê me biqewitîne...

Zimanê *Nûbihar*ê gelik xweş e, şêrîn e weke hingivîn e. Emanet vî zimanî bidomînin. Weke hinek kovarê Kurdî yên dîtir xwe nehetikînin û me ji şermesar nekin. Nebîn kovara hinek xwendevan û zana tenê. Bibin kovara hemû gelê Kurd. Hinek kovarên Kurdî hene, tu dibêji qey bi zimanê Çînî hatine nivisandin; yanê bi Kurdî ne, lê Kurd ji wan fêhm nakin. Kurdên esilê esil ji tê nagehin ka ew çi dibêjin. Lewra ew kovar, teqlîda Tirkan dikin. Ji xwe, vaye li ber çava ye ku ka Tirka çi aniye serê zimanê xwe. Bab ji kurî fêhm nake, bapir ji nevî fêhm nake. Zimanê Kurdên neasîmîle ji xwe zelal e, ne lazîmê zelalkirinê ye. Çend kelîmenî biyanî hebin ji hindik in. Li gora wan zimanê din, ev ji xwe ne ti ye.

Dilovaniye Xuda ser we û hemî ehlê ba-

pirr eşkere ne.

Wekî din jî, li Bakurê Iraqê lêkerên dage-riya TC ku berê xwe daye navçeyên siwîlan, li gor baweriya min mêldara temaşekirina goya dinyaya medenî (!) derbarê Kurda de niyeta Sazumana Dinya ya Nû dide nîşan.

Bi hêleke xwe ye din jî, ev pîrsgirêk ji bo mislimanan di mesaba îmtîhanê de ye.

Di vê mijarê de bédengbûn, tesdîq kirina zilma TC ye. Ev herba necîs, ya ku TC bi îdiaya terefnegîriyê jê re bûye sedem, alîkariya îqtîdara mustekbîr û zordesta ye. Ev ji TC ya ku li herêm qetlîamê dike, dibe moral û destek.

weriyê bê. Em çavnerê hejmarên Nûbiharê ne, bi dil û can.

Ev çend rêzin, bo *Nûbihar*ê min nivîsîn. Her çendî ne layiqê *Nûbihar*ê ne, bes weke hozanê Ereb gotî:

“Înnel hedaya ela miqdarî muhdiyeha”

STÊR BIKENIN BI ME RE DÎSA

Stêr bikenin bi me re dîsa / Hogirik rewşen bê koma sêwiya / Di tinetiya şevê de / Bila gul û dil xwe pêkbînin / Ji bo hatina roja evîndar / Dîsa... / Biteqê kehniya jînê / Ji singa feleka xayin / Eva hat bihar / Nema ji dijmin re ti cih û war / Bila Zaxros reşpûsiya deynê / Bila Gabar û Cûdî bikevin dîlanê / Bişûn ji dilan kula gumanê / Biharê li cîhanê bigerê / Li singa birîndar wê vedê ji gula çeperê / Şîna seqerî şîndikê newrozê berê / Şev avisa sibehê ye

BIHARA LI ZIVISTANÊ

Nûbiharê wek biharê tu geş î
Ronî û şahî hevalbendê te bin
Bo gelê Kurd tu xelatek pîrr xweş î
Şan û deng nîşan û serzendê te bin

Xweş bixêr hatî gelî heyva hilat
Her bilind navê te yê gelkî şêrîn
Sed mubarek tu ji bo ehlê welat
Kewkeba se'da te her banî bimîn

Leşkerê tarî biqestîn dûjexê
Tu ji vê axa beyar jînê derîn
Da ku alem zanibe saxin ku hê
Zarowê Norsî û wî şêrê Hitin

Ehmed Dogan

Ev pîrsgirêk, ji hêla rejîma laîk û nijadperist hatiye rikkirin. Pîrsgirêka Kurdan, di netîca zordestiya ravêja (tawir) politîk û fealiyetên tije eziyet, hatiye holê. Ev pîrsgirêk, ji bê dadiya pevrebûn û yekîtiya dewletên herêmî derketiye. Pîrsgirêka Kurdan, dexla yekîtiya pevxebat, hemdil û yekhêziya hêzên kedxwar û dewletên herêmê, ji Kurdên mazlûm re rewşa dîtine.

Bi kurtî, ev bûyer ji menfetperistiya xebîsa malê dinyayê derketiye. Ev jiyana pîrr bi jan ku îro Kurd pê hember bûne, ji şerê parsêl nekirina dinyayê têgihîştin dibe (der dikeve). Ev nenêrinan, ji raman, ravêj û lêkerên zor-

Hz. Omer dibêje:

Hz. Ömer (r.a.) piştî ji bo xelîfetiye hate hilbijartin, derket minberê:

—“Xwedê xweş nabîne, ku ez xwe layiqê cihê Ebû Bekir bibînim.” got û pêplûkê hate xarê.

Piştî pesna Xwedê, wiha got:

—“Quran’ê bixwînin de ku hûn bi wê werin naskirin. Bi Quran’ê kar bikin ku hûn bin ji civata Quran’ê. Berî kişandina hesabê, guneh û xêrê xwe bipîvin. Ji bona roja mezin amade bin. Lewra wê rojê tiştên herî biçûk jî, ji Xwedê nayin veşartin.

Di karên serokê ku li hember Xwedê ser hilda be de, ji serok re serîdanîn (îtaet) lazîm nîne.

Ez xwe di kargêriya (îdare) xezîne (gencîne) de wek weliye kesên sêwî dibînim. Hewcedariya min tinebe, ez ji xezîne tiştêkî nastînim. Hewcedariya min hebe jî, qasî têrî min bike ez ê bistînim.” (*Hadîslerle Müslümanlık*, rûpel 1808)

Wergêr: **Heqperest**

destan ku ji musted’efan serxariyek bê şert û şurt dixwazin tête holê.

Pirsgirêka Kurdan, ji têgihaya (anlayîş) hukumraniya ne Îslamî û ne însanî ku mirovên hemdemê me qebûl dikin, der hatiye.

Weke, xusûseke din î muhîm ku tête veşartin, hebûna rist a baweriya dînî û awayê raman û îdeolojiyê ye ku gelan bi îstîqrar pev girê dide. Ev rewş bi taybetî ji xelqê rohilatanavî re bi rewac e.

Lêbelê nîzam û baweriya Îslamî, ku ji bo xelq jiyanêke ahengdar bidomînin, êdî mewcûd nîne.

Ev bi sedsalan e dîne Îslamê ji bona ahengdariya miletên Kurd, Ereb, Tirk û Faris adeta wezîfa katalîzore kiriye. Gava ev rista ber bi fetisandinê ve çûye, bi timî sist bûye û hatiye noqta qetûnê. Êdî bi dîtinekê eşkere, tefrîq û belavbûn hate jiyîn.

Di pey vê merhala giring û Cenga Parekirina Yekemîn, li herêmê bi serkêştiya hêzên emperyalîst, bi sînoren sînî avatiya devletên laîk-neteweyî hate destpêkirin. Di vê bûn û nebûnê de em dibînin ku Ereb û Tirk û Faris bi hostetiyeke mezin, li ser bingeha netewî û milî dewletên xwe saz kirin.

Di vê navê de, gelê Kurd ji ber ku jebûna rista yekîtiya dînî dereng îdrak kirin, bi lêker û parmenda gelên din ve hate perçekirin û belavkirin; welhasil em bûn şahidê parekirina wan.

Yek ji van hêzên kedxwarên herêmî ku di parekirina Kurdistanê da cih girtiye, dageri-

ya TC ye. Bingeha xwe li ser irqçîtî û nijadperistiya Tirkî tasis kiriye. Xemnak be jî em dibînin ku ev dewleta laîka hevdem (TC), mozaîka gelên Osmanî, kare bête gotin, di nava bîst û çar saeta de wan tine hesiband û dest bi Tirkkirina wan kir. Di şevê de bi ma’rifetên hokus-pokus hevçend miletan tine qebûl kirin û bi teoriyên xwe yê meşhûr, îdia kirin ku herkes bi xwîna esîl (!) bûye Tirk. Axir dest bi înkara temama xelqan kirin.

Em dibînin ku hinin ji Kurdan, gava ku bi vê ravêja bed a siyasî hay bûn, li ber wê dan û bi hemû hêzên xwe li dijê vê metoda ne însanî derketin. Ev, bi Şêx Seîd dest pê kir û em dibînin ku vaye îro jî didome.

Giringiyeke vê mijarê jî ev e: Çawa ku yekîtiya temama mirovên ku hemnijad in, bi awakî tenduristî li hawîrdora îdeolojiya nijadî û qevmî ne mumkin e, xebatdana yekîtiya mirovên nijadcûda li hawîrdora esasê nijadperistiye jî wisa neheçiyek mezin û avahîyeke çewt e. Ji xwe avahiyên wisa, bê sihet in. Weke rewşa Tirkîyê û Yugoslavya.

Xebata civandina Kurdan an jî gelên din li hawîrdora Tirkçîtîyê cehdek him bed û him jî demeder e. Lewra ev tişt ji Tirkan pê ve înkara hemû gelan e. Ev jî bêdadî û neheçî ye û ji dageriyên sitemkar re zemîn amade dike.

Ev rewşên nenêrin, di jiyana ferd û civakî de dibe sedema xirabûna gelek tiştan. Di pêk anîna ray û raman de civakê bi hêla anarşiyê û belavbûn û hezîmet û herifandin û fetisandinê ve kaş dike. Weke ku nuha hu-

Nûbihar weke mamoste û seydakî, dîn û ziman û gelê me li ber çavê me şêrîn dike

Bi navê Xweda yê arîkarîxwaz û bimer-
hemet! Hamd û minet ji bo Xweda yê
mexlûqan û selama Xweda li ser qasidê Xwe-
da Hz. Muhemmed (A.S.W.) û li ser ehfê
mala wî û hevalên wî be!

Paşê ez gelekî selaman dikim li we û xe-
bata we gelekî pîroz dikim. Roja ku min Nû-
bihar dît, ez gelekî kêfxweş bûm. Ji ber ku
min bi çavê xwe kovareke bi zimanê xwe û
li gora îslamiyê dît, ez gelekî şa bûm. Dax-
waziya min ji we ev e ku, hun di rûpelên
mehnamê de qala tarîxa Pêxemberê me û
pêşveçûna Pêxamberê me (selama Xweda
li ser be) bikin. Di wextê cehaletê de ku bi
çi awayî tev digeriya hun jî di kovara me de
biweşînin. Dawe ewe ku xortên misliman
bizanin, ka bi çi awayî tevgera îslamiyê
bikin. Tarîxa pêşî ya Kurdan, zanayên Kur-
dan û serokên Kurdan, jî kûderê hatine vê
derê û xîzmeta alimên Kurdan ji bo dîn û mî-
letê wan bi çi awayî hatiye kirin, qise bikin.

Ez bawerim, ev xebata ku kovara Nûbihar
dike, gelekî mezin e. Lewra weke mamoste
û seydakî, dînê me û zimanê me û gelê me
li ber çavê me şêrîn dike. Ji ber vê qasê ez

dibêjim: Xwedayê alemê ji we razî be!

Ez ê çend qiteyên helbestên ku min nivî-
sandîye ji we re bişînim û ez bi van hel-
bestên xwe gazî temamê mislimanan dikim
ku, bibin bira ji hev re, cîhadê bikin ji bo
dînê xwe û welatê xwe ji bin destê xwîn-
xwaran û emperyalizmê derînin. Ez dibêjim,
kesên ku bi zimanê Kurdî dizanin, gereke
kovara Nûbihar ji mala xwe kêr mekin.

Ez nizanîm çi bibêjim
De were derdê min bibîne

Sedsalan axîn bikim ez
Da hakim bibe hukmê Qur'an

Ev çi zilm û bêheqî ye.
Çi kirin li ser me feqîran

De bes e ma te nedîtî
Ev xûna reş ji bo çi tê

Adaleta di Qur'anê de
Zilmê nake li ti miletî

Kar bikin da em derkevin
Ji bin zilm û van minetan

Kekê min ger tu mûminî
Çav vekî û zilmê bibînî

Xebat bike tu bê gencînî
Da vê kufrê tu bişkînî

Muhemmed Azadîxwaz

zûr û aşitî û îstîqrara civakê, bûye mahkûma
xirabûnê.

Ji bona helkirina van nenêrinan, çara he-
rî baş û daimî eve ku li herêmê hakimkirina
îdareke Îslamiya gerdûnî ye. Rê nedana si-
temkariya ti nijad û qewmî li ser nijadên din
di çarçîva prensîbê Îslamî de û biratiya Kurd,
Ereb, Tirk û Faris xurtkirin û hurmeta heq, bê
şik ji bona yekîtîyê, modeleke herî ideal e.

Di vê modêlê de ji xusûsên xulqî û fitriyên
gelan re giramî, bingeş tete qebûlkirin. Di mi-
jara mafên gelan de, muamela prensîba wek-
hevî jî pîr girîng e.

Ko em werin xusûsa ku li herêmê di mu-
deteke kurt de çi tişt gereke bib in:

Gelê Kurd ê mazlûm jî, divê li herêmê mî-

na gelên din, bibe xwedî statuya xwe. Ji bo-
na vê avahiyê, divê ku hemû îmkân bêtin
serfikirin.

Dîsa divê ku ji îrada gelê Kurd re bê zor û
zordestî giramî pêk bê.

Wezîfa giring ku dîsa li para me mislima-
nan dikeve; ji vî gelê mazlûm re birina sazu-
mana Îslama bilind; yan jî, divê ku em bibin
xwedî têgiha û ravêjên ji dil, ji bona statu-
ya gelê Kurd jî mîna statuya gelên dinê li
herêm betê naskirin.

Baweriya min eve ku laperînek wisa, hê
Îslamî û hê adil û hê insanî ye û gereke ev ye-
ka neye jibîrkirin.

Îsmetullah Zahirolu
Ji Tirkî: Raserîn BARAVÎ

DEVXWEŞÎ Û ZIKXEZEBÎ Û BOÇA REP

-Li ser şirîktî û dostên xwarinê-

Mehmûd Çeliktepe

Edî gelê Kurd fam kiriye ku *"Zikê gelê me ji xeberên avzêran têr e."* Belê hinek mirov hene qaîlin xwina mirovan vexwin. Gava bu xwarin û vexwarin were birrîn dixeyidin. Ko nagêjin mirovan qaîlin li siya mirovan xînin û mirovan bixînin. Can û malê mirovan tevê navê mirovan bişewitînin û bîkin xwelî.

Gelê mazlûm ji xwe feqîre û neçar e. Malê xwe li pîrr kesan dide xwar in. Ji bo vê ye ku

ketiye xizaniyê. Ku canê xwe bi kesan bide xwarin, wê jîyan li ber wenda be. Lê çawa bike; mal ne ava hevalê xwarinê jî elimiye ku tim bixwe, tim bimêje. Ji pêstatiran ev gotin ji bo mirovên wisa hatiye gotin: *"Heval tamîfî, dest avête ê di jî."*

Gava ku mirov dibêje: Gelo ma em jî qaîlin ku bi mal bin û bi can bin û dost û heval bin. Heger vê gotinê dibîhîsin bîna wan teng dibe û dixeyidin. Ji bo vê ji pêstatiran tê gotin: *"Dostê xwarinê, tim xeydok e."* Hem jî kî di vî demê niha de, bi quwet be û heqê

Bila zalim bizanibin ku em jî hene

Selat û selama Xweda li ser wê be.

Ey brayên hêja; ev helbest bo gelên bîndest min nivîsî. Ko hun di kovara *Nûbhar* de biweşînin, ez ê pîrr şanaz bibim.

Bila zalim bizanibin ku, em jî hene. Li hemberî wan serî bilind dikin û têkoşinê dîkin.

Înşalah demek kurt de tevgêra îslamê quwet bigre û wê zaliman maxlûb bike.

Xweda me û wê û hemû mislimanan ji rêya heqiyê neqetîne.

DENGÊ MAZLÛMAN

Riya wan bi qêrîn û girî bû

Bi xwîn û şîn bû, bi ax û nalîn bû

Geh jî şahî û ronahî bû

Xwîn çar bi çar bû

Çarmandora wan kelehên zaliman bû

Nedisekinîn

Berdewam bûn

Lê çavên wan li sîtemkariyên paşerojê bû
Stûn girtibû zilm li erdê heyani erşa Xuda
Gel ji birîn nav wanda bûn.

Hêviya wan Xuda bû

Nav welatan de zaliman cirît davêtin

Mil û pê dişkênandin, çav derdixistin

Serî jêdikirin, pîsî didan xwarin

Lê ti carî baweriya gel nedîşkêst

Koçber dibûn li Filistinê

Direvîn ji ber zaliman li Bosnayê

Qêrîn û eman dikirin li Kurdistanê

Disekinîn li hemberê zaliman

Lê tovên xwe nav diyarên kufrê de avêtibûn

Xwîna wan gûl dişkivîn fêslên biharê

Deng didan serzemîn bo bilindkirina navê
Xuda

Pêş ve diçûn, rê vedikirin

Ji paşiyar re

Kamuran Uygur

Daxwaziya me ewe ku li ti kesî zilm nebe û ti kes di welatê xwe de nebe esîr û bindest

Bismillahirrehmanirrehîm.

Selama Xweda yê arîkarîxwaz û bimerhemet li ser we û hemû mislimanan be! Ey gelî karbidestên kovara *Nûbthar*! Ez xwuşka we, berê ji bo derhatina kovarê zor spas dikim.

Bi rastî em bendewarê vê hûn. Me dixwest ku em çand û edebiyata xwe bielimin û bidin elimandin. Xweda ji we razî be.

Ez xwendewara kovara *Nûbthar* im û em wisa dixwazin ku hin bi hin bi zimanê xwe pirtûk û kovaran bixwînin û bi zimanê xwe binivîsin. Daxwaziya me ewe ku li ti kesî zilm nebe û ti kes di welatê xwe de nebe esîr û bindest.

Ez ji we tiştêkî dixwazim û qayilim ku di kovarê de sehîfek ji bo me jinan çap bibe.

Armanca me ewe ku umrê kovara me dirêj be û ji dû vê kovarê hin bi hin pirtûk û kovar derkevin. Zor spas!

Ez ji we re helpetekê dişînim. Ko munasib be çap bikin.

MISLIMAN BINDEST IN

Li mislimanan zilm dibe / Ew bûne bindestên neyar û dijminan / Misliman bûne biyanî / Ti kes nasnakê îslamê

Hama û Helepçe û Filistîn / Ê îro bûyera Şirnex / Ê îro li Somalî / Li wana zilm dibe û vana / Bûne xelqê biyanî / Xwediyê wan maye / Yekê bitenê, Xwediyê rehm û kerem

Malê wana kirin yaxme û talan / Şewitandin malê wan, hiştin ber dîwaran / Dikujin zarokên wan dişewitînin kezeba wan / Agir xistin can û bedenê wan

Em ê bigrîn binalin bi van zilm û zordariyan / Em ê hêsrana bibarînin ji bona xelqê bindest / Daxwaziya me ewe ku şefaqa azadiyê / Îşlah ewê derkeve li ser xelqê mazlûm

Sumeyye Amed

gelên bê kes bixwe ew bi qedr û qîmet û bi rumet e. Çiqas zalim dibe bila bibe...

Malûme ku di nav pîrr gelan de çerx çep digere. Ji bo ku zalim weke gur zik bi xezeb e, der û dor jê ditirsin û xwe jê disitirînin. Mîna Tirk dibêjin: "*Ji heştirme (deve) meztîntir fîl heyê*" lêbelê kî çiqas bi xezeb dibe bila bibe, kî çiqas weke rovî kone dibe bila bibe, ko sebra şêr qedîya û hêz kir xwe, wê heval pîrr îbret û aqil jê hilînin. Lê dem û dewran bi destê Xweda ye.

Heta îro kî ji mala xwe xeyidiye qehra xwe serê gelê Kurdên mazlûm de belav kiriye. Kî hêrs dibe, canê gelê Kurd dişewitîne. Bi can û mal û namûsa gelê Kurd dileyizin. Xanî, mekan, çarşî û dikanan cayir cayir dişewitînin. Bûkê ser bi xêlî û dest bi hine, li malên bavên dimînin. Zarok bê dê û bê bav li ber dîwaran stûxwar dimînin. Kes ceza naxwe, kes heq û hiqûqê mazlûman ji kesî

pîrs nake.

Mîna listika zarokan û çîroka şivanan! Şivan dibêje: "Pezo çima tu naçêrî?" Pez dibêje: "Çima gur me dixwe?" Dibêje: "Guro çima tu pez dixwî?" Dibêje: "Çima kuçik me dixeniqînin?" Dibêje: "Gelo kuçikno hun çima guran dixeniqînin?" Dibêjin: "Çima bêrivan nanê sorik didin me?" Dibêje: "Bêrivanno hun çima nanê sorik didin kuçikan?" Dibêjin "Çima mişk çuwalên me diqetînin?" Dibêjin: "Mişkno hun çima çuwalên bêrivanan diqetînin?" Dibêjin: "Çima pisik me dixwî?" Ji pisikê pîrs dikin: "Tu çima mişkan dixwî?" Dibêje: "Ez dixwim û simêlên xwe jî badidim." Xeynî pisikê giştik sûç davêjin stuyên hev.

Belê îro heq û neheqî dest hev de awaz awaz e. Heta niha yên ku li Kurdan zilm dikirin giştika xwe dikirin boyaxan. Heta vê gavê xwe dikirin xwediyê heqiyê û şop li ser xwe wenda dikirin. Lê îro her tişt li ber çava

ye, hem li Kurdan didin hem jî simêlên xwe badidîn. Ma Şîrnex çima bi mal û dikanan ve şewitandin? Wekî li ber mêran ordî hebin, tevî kal û pîran, zar û zêçan dan ber topan û pergale Kurdan belavkirin.

Îro pergale Kurdan belav bûye. Mal û can û welatê wan li wan bela ye. Heval û hogirên wan jî, li wan qet ne guhdar in. Gelê Kurd ji welatê xwe, ji malê xwe dest berdaye. Dest ji doza axê berdane. Lê hov doza namûs û canê wan dikin. Hewar û gaziyên wan dibirrin. Lê dinya rojekê tenê nîne. Bi siya darê kî bawerî bîne wê bixape

Bi texmîna min, li bal Kurdan ti konetî û fêlbazî û daf û feqdanîn tineye. Weke roviyan kone, weke guran zikxezeb nînin. Şêr in, lêbelê Xwedê ji kesî re xirab neyne. Dobra dobra ne. Bi qelbê xwe yên saf û delal dimêşin.

Boça rep ji bo me îbret e. Lazime ez vê çîrokê bibêjim:

Dibêjin şêr û gur û rovi heval û şîrîkê hebûn. Rojekê li hev dicivin. Şêr dibêje: "Brayên min ê can, kerem kin. Îro ez pîr birçî me. Em li çol û çolistanan in. Erd hişk e, azman jî dûr e. Welat xerab bûye û ewleyî li cîran nabe. Em jî brayên hev in. Ez û we, hun û Xwedê. Baweriya min bi brayên wekî we tê. Hun û şan û şerefa xwe!"

Malûme ku, şan û şerefa gur, zalimiya wî ye û nefsa zikê wî ye. Ji berê de dibêjin: "Çavên gur li hêvîya dûmanê ye." Rovi jî qeweta berxwedaro nîne. Lê plan û dubarên wî pîr in. Ji xwe re karibe li mirîşkan digere û weke gur ehmeq nîne. Li ser şêr ne hewceye em tişteki bibêjin. Navê mêr li ser e. Zilm lê bibe ef nake û qeweta wî jî heye.

Em dirêj nekin: Şêr dibêje: "Brano em birçî nin. Ka kî wê ji me re miyekî bîne ku em ji xwe re bikin şiv?" Gur destên xwe li sînga xwe dixê û dibêje: "Ez ê bînim."

Gur miyekî tîne serjê dike. Şêr pîr spas dike û dibêje: "Ka kî wê ji me re par bike?" Dîsa gur destên xwe li sînga xwe dixê û dibêje: "Ez ê par bikim." Gurê me goşt dike sê par. Goştê şênê xweş ji xwe re digre. Hestî mestiyê hişk dide şêr. Hur û murê gemarî û kemêlan jî dide rovi.

Rovi kone ye, xwe diqilqilîne, lê hêwirê wî tineye ku li hember zilmê rabe.

Şêr bala xwe didiyê ku di çanûnan de ne

şîrîkiya wisa bûye, ne jî bratî. Fam dike ku gur zalim e û qedxwar e. Wî çaxî hêrs dibe û radibe gur li erdê dide, devê wî dike nav herriyê û dixeniqîne. Boça gur li hewa rep dibe û dimire.

Şêr vedigere ser rovi û dibêje: "Brak wî goştî têke tevlihev." Rovi bi lez goşt gişî berhev dike. Lewra tîrsa şêr ketiye dilê wî. Li ber şêr dikeve selamê. Şêr dibêje: "De heval, tu vî goştî par bike." Rovi goştê şênê xweş dide şêr. Yê hestî û kemêlên gemarî jî ji xwe re digre. Şêr goştê xwe dixwe, rovi jî hestî û kemêlên ber xwe dikoje û pê dimêje.

Şêr wî çaxî vedigere ser rovi û dibêje: "Gelo brak te vê edalet û hevaltiya bê hîle ji kî girt?" Rovi gurê mirî nîşan dide û dibêje: "Weleh rûyê min ji te reş. Min hemû edalet û îbretê ji vê boça rep girt."

Belê brayên ezîz, dinya derewîn e. Ko Xweda hez bike, şêrên Xweda pîr in. Dinya di destê Rebbê rehîm de ye. Brayên Dimilî dibêjin: "Şeno û kenno" yanê dikare û dike. Lê hema heta kîjan rojê? Heta ku boça hineka rep bibe. Westê ku boça hinekan rep bû wê hinek zikxezeb û fêlbaz û konê wê werin rê.

BERXWEDAN

Berxwedanî karê me ye
Serhildan jiyana me ye
Têkoşinî şolê me ye
Rizgarî armanca me ye
Hemberî nîşana me ye
Yekîtî her rêya me ye
Û Kurdistan dêka me ye
Îsanperwer birê me ye
Welat li hêvîya me ye
Serxwebûnê çav li me ye
Ev rêça her rêça me ye
Ji bil vê çare tine ye

Hesenî

TÊKEVE RIYA RAST DILO

Wê çibe ku'j îro'w pê de
Tu fesadê terk kî dilo
Geh li gunehê xwe bigrî
Geh genaet bikî dilo

Kar û îşê te fesad e
Hirs agirekî şewat e
Wê çibe ku tu van tev bi
Agir de bavêjî dilo

Heta kengî ezê'l te bêm
Canê xwe bi agir bavêm
Wê çibe ku tu jî carek
Bi a mi bikî ho dilo

Dinya dijminê xelqê ye
Meqsed ew Canê Can î ye
Bizan ku dinya fanî ye
Wer dinyayê terk ke dilo

Yûnis Miskîn sax namîne
Canê xwe qurban dibîne
Were xwe hispêre Sibhan
Têkeve riya rast dilo

Yûnis Emre

Ji Tirkî: Hozan Oflaz

NÛBIHAR NEXWENDIN, KÊMASIYEK E!

BIXWAZE ÇAVÊ MI GIRYAN DIKE DOST

Bixwaze çavê mi giryan dike Dost
Bixwaze dilê mi biryan dike Dost
Bixwaze bi axê yeksan dike Dost
Bixwaze bi lutfê îhsan dike Dost

Bixwaze Ew dilê mi xendan dike
Bixwaze Ew canê mi canan dike
Bixwaze Ew sirrê mi seyran dike
Bixwaze qetra mi umman dike Dost

Bixwaze weke avê diherikim
Bixwaze weke bayê dilerizim
Bixwaze di firqet de diwezwizim
Bixwaze wusletê îhsan dike Dost

Bixwaze mi ji şahî dike geda
Bixwaze b'zêcre bi mi dike cefa
Bixwaze ji hûriyê dide sefa
Bixwaze mi ebdî siltan dike Dost

Bixwaze weke derya difûrîne
Bixwaze weke keştî dihejîne
Bixwaze bi derda mi dinalîne
Bixwaze nutqa xwe pînhan dike Dost

Bixwaze l'erş û sema digerîne
Bixwaze nav û nîşanî namîne
Bixwaze mi bi şal dizeyinîne
Bixwaze cismê mi uryan dike Dost

Bixwaze eşqa xwe can re dike feq
Bixwaze dibêjim sirrê "enel heq"
Bixwaze mal û milkê mi dike peq
Bixwaze mi Ummî Sînan dike Dost

Ummî Sînan

Ji Tirkî: Hozan Oflaz

XELASIYA KURDAN BI ÎSLAMÊ YE

*Azadiya ku ne bi Qur'anê be,
azadiya ku ne bi şerîet û îslamê be,
koletiyêke nû ye. Em wê koletiyê naxwazin.*

Muhemmed Guner

Birano şopa kufre rabuye. Mal û zarakan, bav û biran, dê û xuhan dibe. Jiyana axretê talan dike. Jiyana dinyayê wîran dike. Werin em ji vê şopê re bibne weke Sedda Zulqerneyn, bibne pal û piştê ji hevûdu re û tiştên giranbiha ji destê zilmê xelaskin. Em namûs û şerefê xelaskin, jiyana axretê û dinyayê xelaskin. Em tiştê erzan ku weke zibil bêqiyet e, nekne bar li piştê xwe.

Erê birano, yekitiya me ji hav re, pişt û palekitiya me li hember vê kufre weke Sedda Çîn û Maçîn pur bi biha ye, pur bi qiyet e. Esasê azadiya gelen, zanîn e. Xizanî û nezani, esasê koletiyê ne. Loma gelê Kurd zû tene xapandin. Lê em kesî naxêpînin. Ji nezaniyê em bûne weke pêkenokê ji xalqên din re.

Meyzekin li Sûrî, li Iraqê û li Tirkîyê; bi malê me, bi axa me, bi milkê me zordestiyê û zilmê li me dikin. Xwîna me dimijin. Azadiya gela, gehîştina mafan bi zanîne ye. Zanîna bê yekîti jî fêde nake. Belavbûn, sutû xwarî ye, belengazî ye.

Kafir tev xwînmij in. Reva ji ber zilm û zordestiya Emerîka û ketina bin emr û fermana dewletekî din ku ew jî kâfir e, ne azadî ye, ne xelastî ye. Ev hezar û çarsed sal in bavê me, kalê me xebat ji bo Qur'an a Mecîd kirine. Xayinî li vî kelmê qadîm nekirine. Şerîeta pîrûz hê jî di nav gelê Kurdistana Sûrî, Iraq û Tirkî de birûmet e, bi-

şeref e û bi qiyet e. Zerara gelê Kurd ji Şerîeta pîrûz qet nebûye.

Qur'an a Mecîd pêşveçûnê qedexa nekiriye. Şerîet ji pêşketinê re nebûye sedd û kesê pêşketî nekiriye pêkenok. Xwendevanê me yê jîr û zana, em şiyarkirine ji bo yekîtiyê û şîretê azadiyê li me kirine.

Birano! Çend rêşas û xêvik, we nexapînin. Dewlet weke hirçê ye. Hirç ku qehirî, dostaniyê tavêje û dest bi neyartiyê dike. Menfaeta dewletê ku ji te tinebe, nabe dostê te.

Neyartiya Qur'anê, însan dike kafir. Neyartiya Qur'anê, însanan bê dîn dike. Hezkirina herduka, esasê yekîtiyê ye. Hezkirina herduka, esasê biratiyê ye.

Bi yekitiya gelê Kurd, mafê Kurd û Kurdistanê wê bête sitandin. Kurdistana bê dîn, dozeke rêşasî ye. Dozeke xêvikî ye. Esasê yekîtiya însanan misliman, di Qur'an a Mecîd de, Sûreta Welasr e. Lewra Xuda (c.c.) di vê sûretê de, çar wazîfan nişanî însanan dide. Ko ew her çar wezîfe bêne cih, yekîti çêdibe. Ko yekîti çêbû, ji azadiyê re sebeb hazir dibin. Ew çar wezîfe jî ev in:

1- Îman anîn: Yanê baweriya bi wan emrê ku Peyamber anîne û ji me re hatine gotin.

2- Emelê salih: Emelê qenc. Ma ji yekîtiyê çêtir emel heye ji bo însanê mazlûm û bindes? Selamdana lihev û rûkenîti bi hev re jî, emelê qenc in.

3- Şîreta heqiyê: Heq, emrê Xuda ye. Azadî ji mazlûman re jî, emrê Xuda ye.

Esaret, koletî û bindestî, ne xweş in. Merivê misliman lazime ku ne esîr be, ne kole be.

4- Şîreta sabrê: Lazime misliman ji mislimanê din re, li hember haramtî û tengasiya dinyayê û li hember zilm û zordestiya kafiran û têkoşina ji bo îslamê, sebrê bibêjê. Ji koletiyê, ji esaretê, ji bindestiyê mestir, bela kufre ye. Haqê misliman ewe ku, azad be.

Mezkekin li dinyayê: Li Somalî, Bosna, Filistin, Hama, Helepçe û Kurdistana şêrin mezkekin. Tişe zarokên sêwî, jinên jinbî û tev kesên mazlûm û bindest in.

Birano! Rêşas û xêvikê aqilkêm û mejgêj, we nexapînin û di bin navê azadiyê de, we nekin koleyên kufre. Destê biratiyê bidin hev. Weke şêran qîrînkî û azadiya bi îslam bixwazin. Biratiya kufre, menfaeta dinyewî ye. Menfaet ku xelas bû, yekitiya wan jî xelas dibe. Li ber çava ye dewleta Rûs. Têkoşina me ku ne li gora reya Muhemmed (s.) be, naçe serî. Di reya azadiyê de lazime rêber ew be. Xwînrijê weke Lenîn, xwînrijê weke Mao, ti kesî nakine xwediyê ti tiştî. Gelek ji însanên bindest, bi seroktiya Muhemmed (s.) gehîstine mafên xwe. Ko em jî di reya wî de bimeşin, em ê bighine azadî û mafên xwe.

Azadiya ku ne bi Qur'anê be, azadiya ku ne bi şerîet û îslamê be, koletiyê nû ye. Em wê koletiyê naxwazin.

XWENDIN

Xwendin îlm û îrfana me
Xwendin xilasbûna me
Xwendin çand û hunera me
Xwendin pêşveçûna me

Xwendin emrê Xuda ye
Xwendin me re çira ye
Xwendin rêya sehaban
Xwendin xezîna aqilmendan

Xwendin dijminê cehaletî
Xwendin rewşena wî mîletî
Xwendin azadiya welatî
Xwendin tu me re xelatî

Xwendin rêya aliman
Xwendin nexwazê zaliman
Xwendin dermanê derdê me
Xwendin avabûna erdê me

Xwendin ruh û canê me
Xwendin keştiya behrê me
Xwendin kest û banê me
Xwendin felah û karê me

Ebdillah Remezan Wanî

BIBIN ABONE
Û ABONEYAN
JI NÛBIHAR RE
PEYDA BIKIN!

BEDÎUZEMAN SEÎD Ê NORSÎ

Em vê nivîsarê bi munasebeta 33'emîn salgera wefata seydayê hêja Bedîuzeman Seîd ê Norsî diweşînin. (Rehmeta Xweda li ser vî seydayê hêja yê me be, heta roja qiyametê.)

SULEYMAN ÇEVİK

Jiyaneke 87 salî.

Bi şeref, bê tawîz.

Bi mucadele, bê minet.

Bê îmkani, bi xizani, di hewcedariyê de.

Di bin zilmê de, di cengê de, di koçberiyê de, di dadigeşan (mehkeme) de, bi nexweşî, di esaretê de, di hepîsxanan de...

Ev şertên giran di jiyana wî de tim pê re heval bûn. Ti tişt ji pişt Seyda re nebû qewet... Bi ser de jî pirsên welatê wî lê bar bûn. Lê ew, di nav van şertên giran de tim şad û mesrûr bû. Ti car jî zorê û tadaya ku dikşand gilî nedikir. Çi tişt wî bêşîne, çi tişt wî ecîz bike, tim û tim dilfireh û dilgeş bû. Lewra wî dizanîbû ku: *Çawa siba vê şeva tarî beye û çawa bibara vê zivistana seqem beye wisa jî bê guman wê bibara haşrê jî bebe...* Ev zor û tadana wê doza derxînin ronahiyê. *Heger mîletê xwe di seadet û xweşiyê de bibîne, jî agîre cebennemê re jî razîye, heger mîletê wî jî seadetê mebrûm be, cenetê jî naxwaze...*

Ti car hêvîdariya xwe wenda nekir. Her dem ji der dorê xwe re jî şîretên hêvîdariyê, yekîtiyê û ayendeyên (îstîqbal) ronahî kir. Li gor wî: *Lazîme mîslîman hêvîdar bin, hêviya xwe wenda nekin. Wê wextî, wê dengê tewr bilînd, dengê îslamê be. Tiştê ku mtrovan jiyandar dike, hêvîdari ye. Tiştê ku mtrovan dikuje jî, bêhêvîtiye.*

87 sal jiyana xwe de bi navê zewqên dinyayê ti tişt tam nekir. Umrê wî tev di hepîsxanan de, di koçberiyê de, di meydanên

cengê de derbas bû. Nezewicî ku xwedî zarokan bibe, kitêb nivîsandin, heqîqetên îslamê nîşan da, şargirdan da xwendin. Bi van xebatên xwe tim û tim mesrûr bû. Ev şargirdên wî jê re bûn ewlad, ewladên şîrhelal...

Dijminê îslamê dixwestin ku miletek mazlûm di nezaniyê de bifetîşînin û wenda bikin. Baweriya Seyda ji zilmê re bê dengî qebûl nedikir û bê deng nema. Heta dawiya jiyana xwe jî, ji bo welatê xwe, ji xebata xwe tewpaş de neket. Ji bo pêşde birina welatê xwe û ji nezaniyê xelaskirina xelgê xwe her dem xebat kir li xelqê xwe şîret kir. Ji zordestan jî heqên kurdan xwest û ji vê rêyê venegeriya. Ma ne ji vê sebebê bû ku zordestan Seyda koçber kirin û 28 sal ji welat û xelqê wî dûr hiştin?

Jiyana wî de li Kurdistanê avakirina *zanîngeba bi navê Medreset'uz zebra* jê re bû hedef û armanc. *Zanîngeba medreset'uz Zebra diwê bi Erebi, Tirkî û bi Kurdî talîmê bike. Di zanîngebê de ilmên dînî û fenî bibeve re bêne xwendin. Lewra, ronahîya wîcadanê me ilmên dînî ne. Nûra aqlê me jî fenên medeneyetêne. Ko ilmê fenî û dînî yek bin encax rastî derdikeve meydanê. Heger berdu ilm jî-bev cûda bin, yanê jî-bev biqettn, bi serê xwe tenê bêne xwendin, ji yekî taasub (peristî), jî yê dîn jî hîle û şuphe û înkâr derdikeve meydanê.*

Dijminê heqiyê, dijminê îslamê dixwestin îslamê ji holê rakin. Ji bona ku dînê heq jîbîr nebe û îslam xelet neyê fêmkirin heqîqetên îslamê tim û tim got, tim û tim nivîsand û tim û tim bi jiyana xwe nîşan da.

Li gor Seyda sê meselên mubîm bene: Yek beyat e, yek şerîet e, yek jî îman e. Di noqta heqîqetê de, ya tewr mubîm û ya tewr mezin mesela îmanê ye. Kesê ku xwedtyê îmana heqîqî be, tîrsa wî jî ti tîştî namîne. Îman hem nûr e, hem qewet e. Mirovê ku bibe xwedtyê îmana heqîqî, dikare jî kaînatê re meydan bixwîne...

Seyda bi serê xwe ferdek tenê, bi fikrê xwe, bi baweriya xwe, ji bêdîn û zaliman re ma meydan xwendiyê.

Ji ruknên îslamê ti cara tawîz nedaye.

Hezar serê wî hebin, hazîr e ku jî yek heqîqetek şerîetê re wan serê xwe feda bike. Bi qasî tîlê porên wî serên wî hebin, her roj yek jêbe, dîsa jî jî vê doza xwe qet venagere...

Seyda sîh û sê sal berê, roja 23'ê Adara 1960'î de çû rehmeta Xwedê.

Piştî serhildana Şêx Seîd, wî koçberê Barlayê nahiya Îspartayê dikin. Ev cih ji însanan û bajaran dûr bû û li wî cihî qabiliyet û huner û hostatiya mirova paş de dima, kor dibû. Lê wî li wir dest bi nivîsandina kitêbên saheser kir. Zordestan ji vir koçberê *Eskîşehîrê, Kastamonuyê, Anqerê, Denîzliyê, Emîrdaxê, Afyonê û Stanbolê* kirin. Cih bi cih gerandin. Qet rehetî nedanê, jiyana lê kirin jahr. Wî tim û tim ji welatê wî dûr hiştin. Nehiştin ku rojekê vegere welatê xwe.

Dem, dewra ku dewlet dixwaze îslamê ji jiyana û qelbên mirovan rake û wenda bike... Riknên îslamê ji holê radikin. Mizgeft dibin axurên heywanan. Ezanê vedigerînin zimanê Tirkî û kesê ku bi Tirkî ezanê nexwîne, ceza lê dibare. Qur'anê qedexe dikin. Kes nikare ji navê Xwedê û îslamê behs bike. Bi dîne îslam re dijminatîyeke wisa dikin ku kafiran ev

dijminatîya nekirine.

Li welat rejîm nav mislimanan de bê dînî û bê îmanîyê belav dike. Fert gav bi gav, roj bi roj ji îslamê dûr dimînin, ber bi kufrê dimeşin. Kufreke dehşetdar di welatên mislimanan de, bi destên kesên ku dibêjin em jî misliman in li serê mislimanan bar dibe.

Qur'an'a Hekîm murşîdê Seyda ye. Di hemû adaban de jî rêberê wî ye, meqsedê wî ya tewr mezin, baktmîrtîna bukmên şerîetê ye.



Li Kurdistanê dawa wî çî be, wextê koçberî roava bû jî dîsa dawa wî ew bû. Lêbelê dewleta Osmanî çûbû, dewletek nû li cihê wê ava bûbû. Mirov hatibûn guhertin, qanûn û bûyer hatinbûn guhertin. Yanê rejîm guherî bû. Li ber van guherandinan Seyda bi awakî nû vê xizmeta xwe dom dikir. Çawa wextê li Wanê ji Medresa Horhorê diket xarê, ji bil dawa xwe tiştêkî din nedifikirî û hê li hewa bû *"Ey wax! dawa min"* digot, piştî koçberî Barlayê bû jî, heta wefata xwe li ser wê dawê bû. Seîd ê Nû, dîmayika Seîd ê Kevn bû.

Seyda ji bo ku meşa bê îmanîyê bide sekîandin û rêya kufrê bi-birre, bi heqîqetên

îmanê li hember rejîmê disekine. Li Barlayê dest bi nivîsandina Rîsaleyên Nûr dike. Di bin zilm û hewcedariyê de xizmetek bê mîsal tê meydanê. Bi sedan mirov li gund û qezên dorê, bi şev û roj Rîsaleyên Nûr bi destên xwe teksîr dikin. Bi hezaran eded li Tirkîyê belav dibin û ji van kitêban bi sedhezaran mirov feyza îmanê digrin. Ji şivan û gundiyan heta mamoste û profesoran pîrr kesan bi Rîsaleyên Nûr dîne xwe naskirin û Rîsaleyên Nûr ji bo wan bû hevî û sitar.

Sala 1960'î de Seyda nexweş dikeve. Bi ni-

yeta vegere welatê xwe bi çend şagirtên xwe re kete rê. Bi sayeta Xwedê ji taqîbata hukûmatê jî filitî. Gehîşte bajarê Rihayê. Nexweş bû û di odeke hotelê de radiza.

Bi vî halê wî, hukûmatê dixwest û emir dabû ku Seyda dîsa şunde bişînin. Ne şagirtên wî, ne jî xelqê Rihayê ji Seydayê xwe acizbûn. Nehîştin ku wî şunde bişînin...

23'ê Adarê di odeke hotelekê de çû rehmeta Xwedê. Li pey xwe ji malê dinyayê tew tişteke nehîştî bû.

Bi beşdariya hezaran şagirtên wî û xelqê Rihayê, bi merasîmeke mezin Ustad li Kurdistanê di dergehê Îbrahîm Xelîl de binax kirin.

Roj bi roj tirba wî bi hezaran şagirdên wî dihat ziyaret kirin. 27'ê Gulanê cunta leşkeriyê Partiya Demokratê ji îktîdarê anî xarê. Qomîta Yekîtiya Milî ava bû. Vê qomîtê şeva 12 Tîrmeh 1960'î de tirba Seydayê me vekirin. Cesedê wî birin cihekî nebikifîş. Ev zilma ku li Seyda bû, di van erdan de nehat serê ti kesî. Li dinyayê jî tişteke wisa nehatiye bihîstin. Ev hovên ku di saxiya Seyda de rehetî nedanê, ji cesedê wî çî dixwestin?

Bi baweriya Seyda; *mirîna wî wê ji jtyana wî zêdettr, jî vî dînî re xizmetê bike û mirîna wî wê mîna bombê bi serê zaliman de bteqe û wê mêtjyê wan belav bike.* Bi rastî mirina Ustad bi serê wan de mîna bombê teqîya. Her roj bi hezaran mirovan tirba wî ziyaret dikirin. Bi hezaran mirovan kitêbên wî dixwendin û îmana xwe xelas dikirin. Bi hezaran mirovan hê nûh Seyda nas dikirin û rêya wî de dimeşyan. Xuyabû ku mirina Seyda jî ji dînê heq re xizmet dikir. Doza wî roj bi roj hê xurtir dibû.

Mebûsê Partiya Refahê yê Stenbolê û endamê Qomisyona Mafên Însanan Hasan Mezarçî, ji bo nîşandana qebra Ustad û îadekirina îtibara wî pêşniyarek da meclîsê. Di nav gelemperî de jî, ev mesele pîrr hate axaftin. Qenalek televizyonê jî îlan kir ku, tirba Seyda li Îspartayê ye. Bi rastî cihê tirba Seyda nebikifîşe. Dibe ku li Îspartayê be, yan jî li cihek din be. Ev pîrr jî muhîm nîne. Lêbêlê vekirina tirbekê nemerdiyek bê mîsal e û lazime hesabê vê ji wan zaliman were pîrskirin.

Diz li holê ye. Ev diz, dewlet e. Tiştê ku di ziye, lazime şunde bide û ji xwediyê tiştê efuya xwe bixwaze. Îro şagirtên Seyda li benda vî dizî ne ku were û efuya xwe bixwaze.

AX DERDÊ AZADIYÊ

Dilê dayikan û canikan dişewite
Leşkerê kafiran ketiye nav gulistanê
Zar û zêç li holê mane
Kanê we digot: Doza me ji bo
mazlûman e

Xort u qîzê me ketine rêyan
Evîn ketiye nava dilê wan
Digerin ku peyda kin dost û yaran
Ji bo xelasbûna gulistan

Werin qebûl nekin hêsîrîya
zordestan
Serê xwe rakin, destê xwe
girênedin ber wan
Bila mirina me ji bo Xweda be
Werin xelaskin gulistane me

Roj li ser me bû giran
Xwîna zarokan bû mîna baran
Wana kî ne, nabin ber destê me
xulam
Lo de rabin, hun in zarokê gulistan

Ey gelê mazlûm û mustez'ef
Koletî bese, bese çaçitî
Baş bizanin ku:
"Dara azadiyê bi xwîn û xwêhdanê
tête avdan"

Gulden Yaşa

ÇÎROKA RISTÎ

M. AZAD - SABAH KARA
Wênevan: NAHÎD HEQÎQET

Yek hebû, yek nebû
Çivikek hebû
Xeylî qeşeng
Jêhatî û zereng
Bask û perê wî reng e
reng
Wextê difirî li azman
Ji rengê dibhurî
rengan
Kesk dibû
Zer dibû
Şîn dibû
Rengê sor î tirî dibû
Çik çike çik dikir û
dixwend
Saza wî nebû, bê saz
dixwend:

—Li ser daran
Li ser şaxan
Ser deviyan
Nav deviyan
Bi vî alî
Bi wî alî
Him ev teref
Him ew teref

Çivikê me
Şad û şox bû
Ristikek di histû de
hebû
Rengê ristîkê hinî bû
Qeşeng û pîrr spehî bû

Sibeheke biharê
Rojeke qeşeng
Azman, şîn
Gulan, reng e reng
Tav û meh
Sor û spî
Wextê tav derket
Rengê meh firî
Meşî û meşî
Gehişte aso
Banuwa tavê
Hêdî û hêdî
Ji piştê çiya
Hate derve

Dîkê seher
(Ew xweş xeber)
Li hev da bask per
Jêhatî û zereng
Firiya ser ban
Gav û gav û gav:

—Qûqelîqû qûqû
Qûqelîqû qûqû
Kî xew de ye, kî
hişyar?

Ristîcan rabe
Here serê kar!

Ristiyê piçûk
Ji xewê rabû
Çavê xwe xurand
Meşî û meşî

Giha cem hewiz
Dest û rû xwe şuşt
Hate hêlînê
Bi bavê xwe re
Derketine rê
Pev re çûn çolê
Ev der û ew der
Gerîn li danê
Ristî xweşhal bû
Diçû wê derê
Dihat vê derê
Dane dida hev
Çû û çû û çû
Firî û firî
Meşî û meşî
Ho û ho û ho
Bayek diwezî
Ji pembuzarê
Gwîzek çinî
Li hewa gerand
Li erdê maland
Gwîzk gindirî
Giha cem Ristî
Ristiyê piçûk
Rahişte gwîzkê
Bir cem bavê xwe:

—Bavo ev çi ye?
Gelo tê xwarin?

Nikl li gwîzê da:

—Ax, çi bêmeze!

Bavê Ristîcan
Dest bi kenê kir
Nuha nekene, kengî
bikene?

—Na, bavê min
Ev gwîzek e
Naye xwarin ev
Tê lixwe kirin

—Yanê çawa?

—Canê bavê xwe
Gwîzkê distînin
Dendik diçînin
Lê avdan dîkin
Wextê ku şîn bû
Kafi mezin bû
Gwîzkan dide.
Nuha Ristîcan
Raje gwîzkê
Bibe nava gund
Û bide Kîrman
Da nex birêse
Wan nexan bigir
Û bide Cûmker
Da caw çêbike
Cawê xwe bigir
Û bide Rengrêj
Da rengî bike
Dûre jî bibe
Û bide Terzî
Da Mîrza Terzî
Destan pê bike
Ji bona îdê
Cil ji te re çêkê

Ristiyê piçûk
Per lê da û da
Çû û çû û çû
Ser li her ca da:
Ji çiya buhurt
Ji çolê buhurt
Gehîşt nava gund
Çû heta Kîrman
Mîrzayê Kîrman



Nexan dirêşî
Û awaz dixwend
Saza wî nebû
Bê saz dixwend:

—Nex dirêşim ji
pembê
Ji sebtê bi pêncşembê
Înê diçime çolê
Ji bo ger û temaşê

Ristî firî her derî
Teq û teq û teq:

—Kîrman selam

Pembê min heyê
Ma tê birêşî?

—Çima nerêşim?
Helbet dirêşim

—Ko tu birêşî
Vî pembuyê min
Tê çî bixwazî
Ey Mîrza Kîrman?

Kîrmanê delal
Serê xwe hilda
Bir û bir û bir
Li Ristî mêzand

Kenê wî pê hat
Bi zorê xwe girt
Ji Ristî re got:

—Mîrzayê piçûk
Piçûkê miçûk
Ko hebin pere
Zû vir de were
Guhê xwe bid min
Ez dê jite re awaz
bixwînim
Awazê bê saz
bixwînim

—Kîrmanê delal
Awaz bixwîne
Saza te tine
Bê saz bixwîne

Qeşeng bixwîne
Bi naz û eda
Bi dengê bilind
Bilind, bilindtir
Û ji her wextî
Qeşeng, qeşengtir

Mîrza Kîrman xwend:

—Teşî ji min
Pembu ji te
Karê sê roja ji min
Perê kîsê ji te

—Ey Mîrza Kîrman
Ma ka kîs ku ez
Pera bidim te?

Mîrza Kîrman got:

—Êdî ji bo vê
Xem nelazim e:
Pembu bik du nîv
Wî nîvê ha jî
Cardin bik du nîv
Nîvê vî nîvî
Heqê destê min
Nazê şuştê min
Ne zêde ne kê m
Ne kê m ne zêde

Ristî xweşhal bû
Derhal go:

—Qebûl!
Here serê kar
Pembuyî birês
Bistîn parê xwe

Kîrmanê delal
Pembuyî rê sî
Parê xwe stand
Û tiştê ku ma
Da destê Ristî
Mîrza Ristî jî
Rahişte nexan
Bire cem Cûmker

Cûmkerê delal
Cawa çêdikir
Awazê dixwend
Saza wî nebû
Bê saz dixwend:

—Çêke çêke dezgeha
min
Xweş dezgeh û
mezgeha min
Nexan bi hevdu
girêde
Qumaşî çêke ji bo
min

Ristî per lev da





Hat li derî da
Teq û teq û teq:

—Cûmker selam!

Qumaş dixwazim
Ez nex bidim te
Ma tê çêbikî?

Cûmkerê delal
Pê kenî û got:

—Çima çênekim?

Helbet dê çêkim!

—Wextê ku
qumaş
Ji min re çêkî
Tê çi bixwazî
Ey Mîrza
Cûmker?

Cûmker got:

—Mîrzayê piçûk
Piçûkê miçûk
Ko hebin pere
Zû vir de were
Guhê xwe bid
min
Ez dê ji te re awaz
bixwînim
Awazê bê saz
bixwînim

—Cûmkerê delal
Awaz bixwîne
Saza te tine
Bê saz bixwîne
Qeşeng bixwîne
Bi naz û eda
Bi dengê bilind
Bilind, bilindtir
Û ji her wextî
Qeşeng, qeşengtir

Mîrza Cûmker got:

—Nex ji te
Şeh ji min
Ta ji te
Girêk ji min
Qezenc ji te
Karê şevane ji min
Perê kîsê ji te

Ristî kenî got:

—Ma ka kîs ku ez



Pera bidim te?

Cûmker got:

—Êdî ji bo vê
Xem nelazim e:
Nex bike du nîv
Wî nîvê ha jî
Cardin bik du nîv
Nîvê vî nîvî
Heqê destê min
Nazê şuştê min!

Ristî xweşhal bû

Derhal go:

—Qebûl!

Ristî bi şadî
Rahişte qumaş
Bire cem Rengrêj
Teq û teq û teq:

—Rengrêj selam!

—Eleykum selam
Ristiyê qeşeng
Tu çi dixwazî?

—Va qumaşê min
Ka rengîn bike
Bi rengên qeşeng:
Keskê biharê
Şînê avê
Nîliyê Nîl.
Ey Mîrza Rengrêj
Ko tu reng bikî
Tê çi bixwazî?

Rengrêj got:

—Mîrzayê piçûk
Piçûkê miçûk
Ko hebin pere
Zû vir de were
Guhê xwe bid min
Ez dê ji te re awaz
bixwînim
Awazê bê saz bixwînim

—Rengrêjê delal
Awaz bixwîne
Awaz bixwîne
Saza te tine
Bê saz bixwîne
Qeşeng bixwîne

**Bi naz bixwîne
Bi dengê bilind
Bilind, bilindtir
Û ji her wextî
Qeşeng, qeşengtir**

**—Reng ji min
Qumaş ji te
Karê şevane ji min
Perê kîsê ji te**

**—Ey Mîrza Rengrêj
Ma ka kîs ku ez
Pera bidim te?**

**—Êdî ji bo vê
Xem nelazim e:
Qumaş bik du nîv
Wî nîvê ha jî
Cardin bik du nîv
Nîvê vî nîvî
Heqê destê min
Nazê şuştê min
Ne zêde ne kêr
Ne kêr ne zêde**

Ristî xweşhal bû
Derhal go:
—Qebûl!

Rengrêjê delal
Dest bi kar kir
Reng li qumaş xist
Heft rengê qeşeng
Ristî jî bi ken
Rahişte qumaş
Bire cem Terzî

Terziye delal
Awaz dixwend
Saza wî nebû
Bêşaz dixwend:

**—Bidrû bidrû derziya
min
Derziya pûladî ya min**

Ristî l'derî xist
Teq û teq û teq:

**—Selam Terzî!
Ma tê bidrû
Vî qumaşî?**

**—Çima ez nedrûm
Helbet ez didrûm!**

**—Wextê te qumaş
Ji bo min dirût
Tê çî bixwazî?**

**—Mîrzayê piçûk
Piçûkê miçûk
Ko hebin pere
Bi vir de were
Guhê xwe bid min
Ez dê ji te re awaz
bixwînim
Awazê bêşaz bixwînim**

**—Terziyê delal
Awaz bixwîne
Saza te tine
Bêşaz bixwîne
Bilind, bilindtir
Û ji her wextî
Qeşeng, qeşengtir**

**—Ta ji min
Meqes û derzî ji min
Karê sê roja ji min
Çûna mêvanî ji te
Şêrinî xwarin ji te
Perê kîsê de ji te**

**—Ey Mîrza Terzî
Ma ka kîs ku ez
Pera bidim te?**

Mîrza Terzî got:

—Êdî ji bo vê

**Xem nelazim e:
Qumaş bik du nîv
Wî nîvê ha jî
Cardin bik du nîv
Nîvê vî nîvî
Heqê destê min
Nazê şuştê min
Ne zêde ne kêr
Ne kêr ne zêde**

Ristî xweşhal bû
Derhal go:

—Qebûl!

Terziyê delal
Qumaş jê stand
Destan bi kar kir
Ji bona Ristî
Kinceke îdê
Bi huner dirût
Çî kincê delal!
Ji hemû rengan:
Keska biharê
Şîniya avê
Nîliya Nilê

Çivikê me
Çivikê jehatî û zereng
Teyrê teyran
Roja îdê
Kinc li xwe kir
Hat nav zarokan
Zorok lê mêzandin
Û hemû bi hev re
Lê kirin navî:

—Ristî!

Ristî!

Ristî!

Han Ristiyê me
Ji vê buyêre
Vî navê delal
Li xwe hilanî.

LEŞKERO ŞÊR, BRAO DELAL

Xwînmêjê ma zaf zalîmo
Geh ropêl, esker û tîmo
Ma çi zanê kamo-kîmo
Leşkero şêr, brao delal

Hestoran biya kihêl û meş
Toximê mizgîney bires
Qelb û rihê xwu mek nêweş
Leşkero şêr, brao delal

Xalîs kardi çinyo riya
Aha mayê rubi-riya
Milet meverd no tariya
Leşkero şêr, brao delal

Ma karit dara azadî
Bi bo wişk kokê fêsadî
Şukur Homa, no roj ma dî
Leşkero şêr, brao delal

M.Kemaleddîn Beşîran

Ez qayila kî şima Nûbihar dê Zazakî re zehf ca bidê

Brayê ezîzî...

En verî ez şimarê qandê Nûbiharî zehf spas kena.

Ma qayilê kî ziwane xwo bimusê û bi ziwandhe xwo ya biwanê. Şima Nûbihar dê zazakî rê tayn ca danê. Ez qayila kî şima Nûbihar dê Zazakî re zehf ca bidê. Ez fina qayila kî şima pey dê Nûbihar dê gramerê kurmançî

ZAZAKÎ WATENÎ

Rojê ez varîsta hewnra
Rojan ra îne bi
Mi dî însanî şinê cayin
Dima arêbiyay pê ser camî di
Ezan waneya mi dî jew varîst
zaf derg nê bi kilm zî nê bi
Erdîşin bi çefiyên bi.
Cubbeyên bi şalwarin bi.
Mi dî ney çimê xwe girotî
Fekê xwu akerd.
Ney va ma di namus nêendo.
Ar zi nêendo
Ma qandê rika merdim kişenê
Ma qandê kergên merdim cikenê
Qur'anê ma lîngan bindo
Ma nê şermayenê.
Marê hîrê cay lazîmo
Ya serê koyan
Ya miyanê hepsan
Ya qebra teng
Qelbê mi vinderd.
Zerîya mi teqê.
Tersa ra sereyê mi tewa
Cesareto ki ey kerd
Rustemê Zalî nêkerd.
Nameyê ci Kemalo
Mi va Kemalo bin kutikê to bo.

Bêkes Serkanî

het gramerê zazakî zî bimusnê. Bi heyrê şima ma, hem ziwane xwa nekenê xwira hem ma ziwane ye nivîsî musenê. Ez qayila ki şima mirê alîkar bê.

Allah alîkarê şima bo. Emanetê Allah iy bi.

Osman Şanlı

Adar: Mart ayı.
Aso: Ufuk, ufuk çizgisi.
Aşîkar neaşîkar: Belli belirsiz.
Bafon: Alüminyum.
Bakur: Kuzey.
Banû: Hanım, hanımefendi.
Bazargan: Tüccar.
Berxwedan: Savunma.
Bêje: Kelime, söz.
Bêmeze: Tatsız, lezzetsiz, tadı hoş olmayan.
Bincil: İççamaşırı.
Bingeh: Esas, temel.
Bisûd: Kazançlı, kârlı.
Boç: Kuyruk.
Boran: Kır, bozkır.
Bûyêr: Olay, hadise.
Canbexş: Can bağışlayan, cana can katan.
Caw: Kumaş, dokuma.
Cejn: Bayram, şölen.
Cûmkêr: Dokumacı.
Çavmiçandin: Göz kırpmak.
Çermser: Kızılderili.
Çileyay paşîn: Ocak ayı.
Çivik: Serçe, kuş.
Danûstandin: İlişki, münasebet.
Demeder: Çağdışi.
Devî: Çalı, ağaçlık.
Dewsa: ... yerine.
Dilgeşî: Mutluluk.
Dirêsi: Eğiriyordu.
Dubare: Hilecilik.
Dûjex: Cehennem.
Dûmayik: Devamı.
Eşkere: Açık, aleni.
Fermanber: Ast, emirber.
Fêlbaz: Hilekar, sahtekar.
Firax: Kapkacak, tencere, tabak vb.
Gehîştin: Erişmek, ulaşmak.
Gelacî: Arabozuculuk, münakaşa.
Gerdûnî: Evrensel.
Giramî: Saygı, hürmet.
Giring: Önemli.
Gulan: Mayıs ayı.
Gwîzik: Pamuk kozası.
Helhelan: Nara, feryat.
Hêjar: Fakir, zavallı.
Hêwir: Cesaret.
Hilavêtin: Sıçramak, atmak.
Himkuf: Denk, eşit.
Hov: Aptal, salak.


Jêhatî: Becerikli.
Kemêl: Koyunun kuyruk kısmında kuruyan pislik.
Kerihîn: İğrenmek.
Kêmpij: Az pişmiş.
Kîrman: Eğirmen.
Laperîn: Yaklaşım.
Lêker: Eylem.
Mazî: Mazi, geçmiş.
Meze: Tat, lezzet.
Mijar: Konu, mevzu.
Nameyên bêcewab: Karşılıksız mektuplar.
Navçe: Bölge, orta merkez, eyalet.
Navnetewî: Uluslararası.
Nenêrîn: Olumsuzluk.
Nex: İp.
Nîlî: Çivit mavisî.
Nûroj: Nevruz.
Pembûzar: Pamuk tarlası.
Pengivîn: Durulmak, dinmek.
Pergal: Durum, vaziyet.
Pûlad: Çelik.
Qeşeng: Güzel.
Raman: Fikir, düşünce.
Rawec: Geçerli.
Ravêj: Tahmin, zan.
Razber: Soyut, mücerret.
Rengrêj: Kumaş boyayıcı.
Reşpûşî: Yas giysisi.
Rêstin: Eğirmek.
Riha: Şanlıurfa.
Rik: Dayatmak.
Rist: Bağ.
Ristî: Süslü.
Rojev: Gündem.
Rojhilatanavîn: Ortadoğu.
Sazuman: Düzen.
Sedem: Sebep.
Sitemkar: Zalim.
Şên: Şen, iyi, güzel.
Şox: Şuh, şen.
Tenduristî: Sağlık, esenlik.
Tengasî: Darboğaz, çıkmaz.
Teşî: İğ.
Têgiha: Anlayış.
Tîrmeh: Temmuz ayı.
Tov: Tohum.
Yekhêzî: Güçbirliği.
Zereng: Çevik, enerjik.
Zikxezeb: İçi gazap dolu.
Zîrek: Zeki, akıllı.

ÇEPERAST

1- Di sala 1591 de hate dinyayê. Helbestvan, filozof, alim û nivîskareke bi nav û deng. Sala 1652'an de li Bayezîdê çû rehmeta Xwedê. Tirba wî îro jî, ji terefê pîr kesan tê ziyaretîkirin. Zimanên Erebi, Tirkî û Farsi zehf baş dizanibû. Pîr helbest û nivîs nivîsandine. *Mem û Zîn, Nûbihar, Eqîda Îmanê* kitêbên wî ne. Kitêba wî *Mem û Zîn* heta niha hatiye wergerandinê pîr zimanan. (Wêneya wî di nava rêzepîrsê de tê dîtin) 2- Navê fêkiyekî - Dijê rojê. 3- (Berepaş) Bi erebî "na" - Çêkirin, mal derxistin, îmkîrin. 4- Dîtin, bal, baldarî, dîqet - Xeta di navbera zevî û gund û bajarên de. 5 - Navê pêxemberekî - (Berepaş) Famîlya zimanên taybetî û serbixwe, famîliya zimanên Îndo-Ewropî de beşa Îndo-Îranî. 6- Bi erebî "roj" 7- Nexwaşiyekî mîna romatîzmayê - Behîvok, argûşk, tehnûsk. 8- Talîh, felek, şans - Tirbît, dost. 9- Hejmarek - Bilind, berz, jor. 10- (Berepaş) Mam - Bawer, îman. 11- Haveyn, havîn, meyan, givî - Şerm, şermezarî, fedî, fehêt. 12- Benikê ku ji mûyê an ji hirîye tê çêkirin - Celebekî hermêya çend aliyê wê sor.

SEREJÊR

1- Li ser hemû mexlûqên dinyayê yekîtiya Xwedê - Sala çuyî. 2- Celebek xwarinê - Cihê bi av. 3- Bi kurtebêjî "mîrza" - Şîrik - (Berepaş) Hejmarek. 4- Sifateke peyxamberê me, ev sifata muşîkan jî bi kar tanîn - Navber, nav, navbend. 5- Cihê bêav, bej - Lebatê ku mirov pora xwe pê rast dike. 6- Bi kurtebêjî "Aleyîssalam" - Diranê kûçikan 7- Temeziya ku davêjin serê bûkê - Navê darekê yan jî mêr yan jina ku ji yarê xwe cihê bûye. 8- Kesê ku li cihê meskûn e - Celebek fêkî. 9- Notirvan, parêzkerê rez û bexçan - Kesê bêziman - Tiştê ku ronahî û germê dide dinyayê, tav. 10- (Berepaş) Mûyên rûyê mêran - Maçkirin, paçkirin.



BERSIVA RÊZEPİRSA HEJMARA PENCEM

ÇEPERAST: 1- Qedîr - Amîne. 2- Adar - Asan - Mî. 3- Lo - Armûş - Zîq. 4- Enî - Mela. 5- Berîşt - Qiyam. 6- Eda - Îra - Lîne. 7- Lame - Avde. 8- Al - Maf - Tfin. 9- Egît - Mê - Îno. 10- Etar - Welat.

SEREJÊR: 1- Qalûbela. 2- Edo - Edalet. 3- Da - Enam - Ga. 4- Îranî - Emîr. 5- Rîşî - At. 6- Am - Traf. 7- Asûr - Av - Me. 8- Maş - Êl. 9- În - Milet. 10- Zeyî - Fît. 11- Emilandin. 12- Îqame - Nok.

Amadekar: **ELÎ KEÇELÎ**

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe ve ji hejmara [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyê kovara *nûbihar*.

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiye:

Li hundur: Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

Li derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonatiye dagirin û tevî kopyeyeke pela razandina bedela abonetiye bişînin navnîşana me.

Navnîşan:

Kızıtaşı Cad. Kuruş Apt. No: 51/3 Fatih - İstanbul Tel: 533 75 88

Bedela abonetiye:

Li hundur: 120.000 TL. **Li derve:** 50 DM.

KOVARA ÎSLAMÎ YA KURDÎ (KÛRTÇE ÎSLAMÎ DERGÎ)

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat
(Aylık Kültür Sanat Edebiyat Dergisi)

**HININ DIXWAZIN ZIMAN Û ÇAND
Û HER CÛR HEBÛNÊN KURDÎ YÊN DIN, JI HOLÊ
RAKIN. WAN KÊFXWEŞ NEKE. KOVARA NÛBIHAR
EWILÎN KOVARA ÎSLAMÎ YA KURDÎ YE. BIXWÎN, BIDE
XWENDIN Û JÊ RE ABONEYAN PEYDA BIKE. EV,
MESÛLIYETA TE YA ÎSLAMÎ Û ÎNSANÎ YE.
(BIRILERÎ KÛRT DİLİNÎ, KÛLTÜRÜNÛ VE
HER TÜRLÛ MEVCUDIYETİNÎ ORTADAN KALDIRMAK
İSTEMEKTEDİR. ONLARI SEVİNDİRME. NÛBIHAR İLK
KÛRTÇE ÎSLAMÎ DERGİDİR. OKU, OKUT VE ABONELER
BUL. BU SENİN ÎSLAMÎ VE ÎNSANÎ GÖREVİNDİR.)**

weşanên nûbihar (nûbihar yayınları)

Rîsala Biratiyê / Seîd ê Norsî

Peyivên Piçûk / Seîd ê Norsî

Şırnak Baskını / Osman Resulalan

Bediuzzaman'ın Hayatı/ Abdurrahman "N ursî"

Rîsala Biratiyê (Bi herfên Erebî)

Peyiva Bîst û Seyemîn / S. Norsî

**Di xwestinê we yên tevayî de, kitêbên Kurdî bi 30 %
û kitêbên Tirkî bi 40 % erzanî tèn şandin.**

(Toplu isteklerinizde Kürtçe kitaplarımız % 30,
Türkçe kitaplarımız % 40 indirimle gönderilir.)

Navnîşan (Adres)

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih/İstanbul

Tel: 533 75 88

